# Nordkurdisch/Kurmandschi

1. **Sozdarî li Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad**

“Ez bi vî rengî sozdariya xwe der herqê Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad ji bo Komara Federal a Almanyayê radigihînim. Nemaze ez bi fermi nas dikim:

Mafê gel, di sepandina desthilata dewletê di hilbijartin û dengan û bi rêya saziyên taybet ên qanûndarêştin, saziya cihêner û dadweriyê û hilbijartina nûnerên gel bi awayê gelemperî, rasterast, azad, wekhev û nihênî di hilbijartinan da,

a. Pêwîstiya qanûnan li Makezagonê û pabendiya Saziya Cihêner û Dadweriyê li Qanûn û Dadmendiyê,
b. Mafê damezirandin û sepandina opozîsyoneke parlimanî,
c. Qabiliyeta cihêbariya dewletê û berpirsyariya wê der heqê nûneratiya gelanî,
d. ,Serxwebûna dadgehan
e. Cidatî ji her cûre zorbêjî û dîktatoriyê,
f. Mafên Mirov ên destnîşankirî li Makezagonê û

Eva ku kiryarên dijî cihûyan, ên nijadperestane yan kiryarên din ên ne însanî, bi misogerkirina rûmeta mirovî ya Makezagonê nakok in û li dijî vê pabendiyê ne.

2. **Pabendiya li berpirsyariya dîrokî ya taybet a Almanyayê ji bo hikûmeta neqanûnî ya Nasyonal Sosyalîst**

“Ez soz didim

c) Têkildarî berpirsyariya dîrokî ya Almanyayê ji bo hikûmeta neqanûnî ya Nasyonal Sosyalîst û dûhatên wê, nemaze ji bo parastina jiyana cihûyan, her wiha
d) Ji bo pêkvejiyana aştiyane ya gel û qedexetiya şerê destdirêjkerane“.

3. **Daxuyaniya Sozdariyê**

“Ez radigihînim ku ti hewldanekê naşopînim an pişta wê nagirim ku

a) Li dijî Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad, hebûn an ewlehiya dewleta federal an eyaletekê be yan jî
b) Armanca wê eva be ku bi rêya neqanûnî zerarê bide tevgera fermi ya saziyên Makezagona Federal an Eyaletê yan endamên wan an jî
c) Bi rêya bikaranîna zorê yan kiryarên seretayî ji bo vê mebestê, berjewendiyên derveyî yên Komara Federal a Almanyayê rastî xeterê bîne.

**4. Her wiha**

“Min xwe ji şopandin an piştevaniya berê ji hewldanên bi vî rengî dûr girtiye „.